


# Rapora Min ya Kar û Xebatên YMKê
## 2024

1. Li roja şemîyê 13.01.2024 semînerek ji bo birêz Dr. Mîkaîl Bilbil li dor rastnivîsîna kurmancî hat saz kirin. Ev semînar ji alîyê mamoste mamoste, Mehmûd, Alîşêr û Semîr Xidir ve hat birêvebirin. Semîner nêzîkî du demjimêran berdewam bû. Hejmareke zor ji mamoste, hezkirîyên zimanê kurdî di vê semînerê de amade

bûn.

2. Li roja yekşemê 18.02.2024an bi hevkarî di gel Komeleya Ronak, neh xulên zimanê Kurdî yên onlayn ji bo mamoste Mihemed Keleş hatin vekirin. Jimareke







zor a xwendekaran beşdarî van xulan dinin. Bi hewl û dilsozîya mamoste Keleş ev xulên zimanê kurdî bi rengekî rêkûpêk dimeşin.

3. Li rojên Înî û şemîyê 23-24.2024an sempozyûma roja zimanê dayikê ya navneteweyî bi hevkarîya Yekmalê û GEW a Bremenê li bajarê Bremenê roja zimanê kurdî bi helkefta 30 salîya zimanê kurdî hat lidarxistin. Di van herdu rojan de çendîn semînerên hêja hatin pêşkêşkirin. Ji alîyê YMKê ve mamoste Emîn Akbaş ku yek ji herdu mamosteyên pêşî yên zimanê kurdî li Almanyayê li ser dîrok û xebatên destêkî yên fermîbûna zimanê kurdî li Almanyayê semînerek pêşkêş kir, û Mamoste Abdulqadir Ulumaskan semînerek li dor Bikaranîna Materyalan di Dersên Kurdî de li Almanyayê semînerek pêşkêş kir û mamoste Semîr li destpêka sempozyûmê wek serokê YMKê peyvek pêşkêş kir û li dawiyê jî semînerek li dor Derfetên Dijîtal ji bo Hîndekariya zimanê kurdî pêşkêş kir.

**BERNAME** — SEMPOZYÛMA ROJA ZIMANÊ DAYIKÊ YA NAVNETEWEYÎ

## HÎNDEKARIYA DERSÊN ZIMANÊ DAYIKÊ DI DIBISTANAN DE Û DUZIMANÎ DI BAXÇEYÊN ZAROKAN DE: BENDEWARÎ, RASTIYÊN HEYÎ Û PÊŞEROJ

### *23. SIBAT 2024 - BREMEN*

**15:00 - 18:00: KOMXEBAT**

**Kita Pîya wek modelek ji bo entegrasyona zimanê kurdî di perwerdehiya hêlîn û pêşdibistanê de**
**Moderator:** Münevver Azizoğlu-Bazan
**Beşdar:**
- Pêşkêşî: **Dr. Yaşar Kirgiz**, Yekmal e. V.
- Xebatkarên Kita-Pîya Berlin
- **Anna Lumma** û **Schirin Senger**, Komîteya Navneteweyî ya Rizgarkirinê (IRC)
- Perwerdekarên ji qadê

**Mijar:**
- Bendewarî û potansiyela kurdî di perwerdehiya hêlîn û pêşdibistanê de
- Rastiyên pratîkê, zehmetî û kêmasî di bikaranîna kurdî di perwerdehiya pêşdibistanê de
- Ji bo damezirandina Kita Pîya li Bremenê perspektîf, derfetên pêşvebirinê û plansaziyên ji bo pêşerojê

---

### *24. SIBAT 2024 - HÎBRÎD*

**10:00: XÊRHATIN**

**10:15: AXAFTINÊN VEKIRINÊ**

**Günay Darici**, Yekmal e. V.
**Dr. Sascha Karolin Aulepp**, senatora beşa zarok û perwerdehiyê li Bremenê
**Barbara Schüll**, GEW Bremen
**Samir Kheder Abde**, Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Ewrûpa

**10:30 - 12:00: RÛNIŞTINA TAYBET**

**30. Salvegera Hîndekariya Kurdî wek Zimanê Dayikê li Almanyayê**
**Moderator:** Hamdiye Ertaş
**Beşdar:**
- **Dr. Zerdeşt Haco**, şêwirmend û pisporê perwerdehiya mamosteyan, tevî yekem mamosteyên dersên kurdî li Bremenê kar kiriye

**14:00 - 15:30: PANEL 1**

**Zehmetî û Potansiyel di Hîndekariya Zimanê Dayikê de: Perspektîfên ji Qada Lêkolînê**

**Moderator:** Sona Merzic
**Beşdar:**
- **Dr. Till Woerfel**, Mercator-Institut ji bo Pêşvebirina Zimên û Almanî wek Zimanê Duyem - Zanîngeha Kölnê
- **Şerif Derince**, Akademiya Yekmalê & Zanîngeha Potsdamê
- **Sofia Grigoriadou**, Zanîngeha Duisburg-Essenê


*15:30 - 15:45: Navber*

**16:00 - 17:30: PANEL 2**


















4. Li roja 04. Okt. 2024 em wek YMKe li ahenga damezrandina Fedrasyona Zimanê Kurdî yan Navdewletî de amdebûn. Ji ber kar û xebata Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Ewrûpayê di biwarê zimanê kurdî de, Em ji alîyê desteya reveber ya fedrasyonê hatin xelatkirin. Ev xelat di beşa dabeşkirina xelatan de ji alîyê birêz Şîfa Barzanî ve pêşkêşî YMKê hat kirin û Serokê YMKê ev xelat bi rêzdarî wergirt.










5. Li roja şemîyê 16.03.2024an sebaret pejirandina pirtûkên YMKê bi awayekî fermî li Herêma NRW, me nameyek ji bo Wezareta Rewşenbîrî ya NRW re şand.

6. Li roja pêncşemê 09.05.2024an sebaret pejirandina pirtûkên YMKê bi awayekî fermî li Herêma NRW, me nameyek ji bo Wezareta Rewşenbîrî Heseenê re şand.

7. Sala 2024an me çendîn caran peywendî bi GEWê re kir.

8. Ji bo peydakirina peywendîyan di gel Hikûmeta Herêma Kurdistanl, me çendîn caran peywendî bi Wezareta Perwerdeyê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê re kirin. Ji bo vê yekê Fedrasyona Zimanê Kurdî ya Navdewletî hevkarîyek mezin di nav bera me û Wezareta Perwerdeyê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir.

2024

Semîr Xidir Abdî

Serokê YMKê